روجافا به في هذا العمل المتواضع وأنه أوصل الرسالة بأمانة. وشكر خالدي في نهاية حديثه كل من ساعده وسانده في إتمام هذا العمل منهم السيد محمد هوندي ونقيب الفنانين في كورديستان، قاماً بتأمين الموارف تقديمهم معدات والمخرج لازين محمود تكريمه معدات الإضاءة، مدير الإضاءة سليم سلو، السيد صباح ميراني مدير قسم K A R في قامشلو لكن الظروف لم تسمح لي مقاطع فيديو عن قامشلو وكذلك الصديق هولير وبالتعاون مع مدير المتحف السيد اسماعيل برزنجي، كان بودي التصوير في قنوات زاغروس، السيد سوار أحد تأمينهم بالمجيء".

وأشار خالدي إلى وجود أغانيين من شاعر فرهاد عجمو في اليوم ٢٠١٢ و الذي حمل عنوان الأغنية "ستيرا قامشلوكي" " وأن هناك عدة شعارات له آخرها من الوطن، وهؤلاء أحوالهم سيدة حدا في مختلف البلدان، أغنية (ستيرا قامشلوكي) تذكر يمعن كثيرة من حب الوطن وال الإنسانية التي نحن ب أمس الحاجة لها في هذه الأيام .. و غالبي من اختيار هذه الأغنية هي إيصال رسالة الإنسانية تعبر عن الشعور والحر الوطني وحب الالتماء لكرديستان والمعاناة التي يعانيها أهلانا خارج بلددهم، كوني مقيم في هولير أهلانا خارج بلددهم، كوني مقيم في هولير حالياً".

ويتغير الفنان شادي خالدي أغنية "ستيرا قامشلوكي" "ثورة انسانية بعد ذاتها متمثلاً راوند للسياحة، عادل أبو انس، وكل المصاعد أنا والمخرج حميد مراد



Lî Qewîtiya Miqdad Midhet Bedirxan Miqate Bin Zimanê Kurdî Bikin Zimanê Rojnamegeriyê

bÜyer
PRESS

HAWAR
KOVARA KURDI • REVUE KUHDE

TEXISTYES VE HEYMARE
Tobias Ossman Dr. U.S. Johnson
Hüseyin Küçükay Dr. U.S. Johnson
Sezai Karanfil Yalcin Heskes
Husayn Celîl Heskes
Dervish Çaparoglu Cigerci
Jalal A. Shemani Heskes
Mehmet Tuncer Heskes
Cemal Özmen Heskes
Orkun Heskes
Lutfi Sezgin Heskes
Kemal Heskes
Kemal Küçükay Cigerci
Mustafa Küçükay Cigerci
Külliye Çelik Cigerci

BUREAU PRESSE
La rédaction
Le bureau
Le personnel
Hawar Alaa H. A. Schmid

*Roja Rojnamegeriya Kurdi
1898-2015*



Fîtser û Çiroka Rojane Dê kî ji me re binvîse?!

“Dibe ku di vê kîlîkê de dehê çirokan derbas dibin, dibe ku nivîsandin barekî ji xemgînî yan xweşîya van çirokan hilgire, dibe ku wê benda di navbera xwe û civakê bigre”.

Di rewşen awarte de yên ku milet tê re derbas dibin, niviskar, rojnameger, wênejer, rewşenbir..., ew in ê ku wê jîjîya awarte û hûrbîniyan belge dikin, ligel rojnamegeriyekê ku karê wê yê sereke belgekirin û şopandina rastiyê be.

Li gel vê rastiyê, gelo em ê çawa binirxîmin?!

De ka em tiştan ji hev cuda bikin, û em hemûyan bi heman pîvanê nepivin, jixwe ya rast ew e ku em gazinan li gori erkîn her kesekî ji wan bikin; tev ku erkîn van kesan ne yasaycke nivîsandi ye, lê em dikarin her kesekî ji wan bispêrin wîjdanê wî û hestê wî di aliyeş civak û xaka wî de, ji ber ev e çepera ku tê de pêñûs û kamîrâyê ji dêvla guleyan bikar tê.

Rojnameger û Çirok
Di navbera bûyerên berz de, bi dehê hûrbîniyan hene, ku her çav wan nabînin, Rojnameger ew e segvanê çirokê bûyeran e.

Fitser weki şeweyekî nivîsandina rojnamegeri, ji wan şeweyen jibîkirî ye (Di kovara Hewarê de Fitser hebûn), tevî ku pirr nêzîkî hestê niviskar e ji. Ger em bibejin ku pirraniya rojnamegeran de Rojavayê Kurdistanê de niviskar in, em dê bipirsin gelo çîma şeweyekî mina Fitserê kêm e, ango tune ye.

Li Ewropayê, nemaze pişti cenga



Ebas Mûsa

û ci piroje bi vî zimanî hebe dibe biserkeve dema ku ew nasname li ber çavan be.

Di belavokên siyasi yî kurdi de, yên ku bi rengeki ji rengan dikevin çarçoveya rojnamegeriyê de (ya girêdayî bi nerîn û hîzrîn her partîyekê) hema zimanî kurdi tê re derbas dibe, weke ku ne mijara heri girêng e di nasnameyê de, ligel hebûna kurdi.

Ragihandina kurdi (Televisyon û Radyo), dikaribûn gaveke baş biavêjin aliye ku pirraniya mijaran û bûyeran bi zimanî kurdi ne, bi vê yekê ji temâşevan û guhdarênen xwe, ta radayekê, bi bandora bûyeran ve girêdîdan, lê li vir ji Fitser cihê xwe bi rengeki rewa negirt.

Xwendevanê kurd zehmetiyekê di kwendina kurdi de, dikşînîn, ne weke temâşekirin û guhdarkirinê ye, dibe ku em li benda nivşê nû bin, ê ku di dibistanan de hînî zimanî kurdi dibin, ta ku bi hesanî nivîsîn me bixwînîn, lê ji wan niviskar û rojnamegeren kurdi tê xwestin ku bûyer û hûrbîniyan binvîsin, Fitser ji -weki şewe- ji belgekirinê pêk hatiye, da nîşen ku tên lê vegerin.

Dibe ku mijara nivîsandina bi zimanî Kurdi heri sereke be di çî gengeşeyê de, ji ber girêdana wê bi nasnameya kurdi bi xwe. İro roj zimanî kurdi bi serbestî belav dibe,

Sedem û çareseriyê qelsbûna asta zimanê Kurdi di Rojnamegeriya Kurdi de

Li Qahirayê, di 22ê Nisana sala 1898-an de, Yekemîn rojnameyek bi zimanê Kurdi bi nave Kurdistan hate pêşkeshirin, û di wê demê de, ti saziyên rewşenbirî an cîvakî herweha, siyasi ne çalak bûn, û bi taybet deng û peyva Kurdi, ber bi windabûn ve dijûn, û ji ber vê yekê Rojnameya Kurdistan, a ku bi amedekevîya Mir Miqdad Midhet Bedirxan hatibû derxistin, bibû jêdereki girêng di civaka Kurdi de.

Herweha, di wê demê de, rewşenbirîn Kurd rojnameya Kurdistan, kirin wek cihêki girêng, ku tê de gotin û helwetîn xwe diyar bikin, û yek ji bandorêن bas li ser zimanê Kurdi ew e, parastina zimanê Kurdi bû.

Di dawîya demsala 19-an de, gelek kovarî rojname hatin derxistin, wek rojnameya Roja Kurd a ku di sala 1911-an de hatibû derxistin, û rojnameya Banga Kurdistan di sala 1913-an de ku hatibû derxistina, û ew bi herdi zimanê Kurdi û Tirkî bû. Le pişti hevpymana Saykis Bîko, û di encama perçebûna nexşa Kurdistanê de, rojnamegeriya Kurdi li Tirkîye hate qedexekirin, û hêdi hêdi di dâwiya sala 1920-an de, rojnamegeriya Kurdi li Îranê ji nedihat pejrandin, lê li Îranî bijaranâna zimanê Kurdi, di rojnamegeriyê de, û bi taybet di wê demê de, bi dîz bû.

Hin qavdîr û dirokvanê Kurdi dibêjin, ku sedema qelsbûna zimanê Kurdi di rojnamegeriya Kurdi de, sitemkariya her çar réjimê ku Kurdistan ji xwe re kirine par, û belki ev yek sedemek girêng ji sedemên ku rojnameyek Kurdi bi navê Kurdistanâ mezîn, an ji helwesta her çar perçeyen Kurdistanê, nedihat derxistin.

Di salâ 1958-an de, Hükümetta İraqî destûr da herdi partîyen Sosyal û ya PDKê, ku rojnameyên xwe derxinin, û di wê demê de, ronî hat ser rojnameyên Azadi û Xebat de, lê bi guhertina Hükümetta İraqî û pişti 2 salan, karê herdi rojnameyan qels bû, û di eneama buyeren ku li İraqî qewimîne de, karê rojnamegeriyê, bi dîz dihat kîrin, û rojnameya Şoreş hate derxistin, herweha Partiya Rizgarî Kurdistanî, rojnameya Rizgarî derxist.

Rojnamegeriya Kurdi hêst ku hêviyên

gelê Kurd careke din vejên, û bandorek bas li ser belavbûna çanda Kurdi li cihanê hate kirin, û gelek ji karê niviskarîn ku bi zimanê Kurdi di nivîsandin, bo zimanê Ingilîzî Fe-renci herweha Elmanî ji, hatin wergi-randin.

Di heman dema ku karê rojnamegeriya Kurdi careke din çalak dibû, rojnameya Kurdistan, bi zimanê Kurdi hatibû derxistina, û vê yekê qiwetek da çalakirina rewşa Kurdi bi tevahî.

Belki hin rewşenbir û rojnameyan vê yekê baş dibîn, ku Navê Kurdistanê bi zimanê Erebi dihat nivîsandin, û gelê Ereb Kurd û Kurdistanê nas kîrim, lê mixabin, bandora wê ya nîgativ, ew e, ku ew wek hewîdanekê bû, ku zimanê Kurdi careke din winda biba.

Di sala 1931-an de, Mir Celadet Bedirxan dest bikarê derxistina Kovara Hawar kir, û di 15ê Gulana 1932-an hejmara yekemîn hate çapkirin, û pişti sal û nivekê ew hate rawastandin.

Li gori hin niviskarîn Kurd, ku Kovara Hawar bi herdu tipen Kurdi û Latîni dihat çapkirin, û asta ziman û çanda Kurdi bi xwe re bilind radikir, û pişti demek kûr, ew tenê bi tipen Kurdi dihat çapkirin.

Gelek kovarî rojname di diroka Kurdi ya nû de hene, ku ew bûn aliyen alikar di parastina zimanê Kurdi de, û wan hêst ku çandênet netewen din li cihanê, ziman û ramanê Kurdi nas bikin, wek, Kovara Hêwa ya ku bi herdu zimanê Erebi û Kurdi, Kovara Gelawej a bi zimanê Kurdi, kovara Şefeq ya bi zimanê Kurdi û Erebi dihatin çapkirin. Malbata Bedirxaniyan, di xizmeta rojnamegeriya Kurdi de, Herweha ji bo zimanê Kurdi ji gelek xizmetkar bûn, lê mixabin di demsala 20-an de, û di demek de, ku zimanê Kurdi li Herêma Kurdistanâ Iraq, Kurdistanâ Tirkîye, ne qedexe ye, niviskarîn Kurd bêtür, zimanê Erebi yan Tirkî, di karê nivîsandin de, bikar tînîn.

Belki rola siyasi li ser vê yekê gelek giran û dijwar e, lê dema ku em berê xwe didin Kurdistanâ Sûriyê, û pişti derbasbûna çar salan li ser şoreş Sûri, em dibîn, ku derfeta ku niviskarîn Kurd bi zimanê dayîkê binivîsin, heyen, û tiştek li pêşîya wan nasekin.



Riyad Elî

ku ew rojnamegeriya Kurdi bi zimanê Kurdi zengin bikin, lê piraniya wan ta roja iro bi zimanê Erebi dinivîsinin, û balê nadîn giringiya parastina zimanê xwe yê Kurdi.

Heta partîyen Kurdi ji li Kurdistanâ Sûriyê, daxuyaniyên xwe bi zimanê Erebi derdiximin, û sedema vê yekê zelal e, ku kesen ku wê van daxuyaniyên bixwînin, bi zimanê Kurdi nizanîn, ev ji di hindîrî partîyen Kurdi de, pişgirêkî mezin e.

Herwîsî hin malperen ku rewşa siyasi, cîvaka û çandî ya Kurdi li Kurdistanâ Sûriyê dişopînin, zimanê Erebi bi kar tînin, û sedema vê yekê ji ew e, ku hînek qelsbûn di zimanê Kurdi yê kar-mendîn wan malperen de heye, û divê zimanê xwe yê Kurdi baştir bikin, da ku tiştekî Kurdi zelal û paqî pêşkeshi cîvaka Kurdi bikin.

Eger em li çareseriya pişgirêkî qelsbûna zimanê Kurdi di rojnamegeriya Kurdi de, biggerin, divê çareseriya vê yekê di hindîrî partîyen Kurdi de were destpêkîn, ji ber ku piraniya hemwelatiyên Kurdi, endamîn partîyan e, û eger ew ne endam bin, kesek ji malbatîn wan di partîyekî de kar dike, û dema ku partîyen Kurdi daxuyaniyên xwe bi zimanê Kurdi derxîn, ew kesan wê mecbûr bin, ku fîri zimanê Kurdi bibin.

Herweh, divê em wek rewşenbir, li ser belavkirina zimanê Kurdi di alavên ragihandîn de, wek kovar, rojname, û malperen intrîmît, bi zimanê Kurdi kar bikin, û eger derfet li ba kê hebe, dive ew bi erkê xwe, ji ber xwe, rabe, da ku zimanê Kurdi û rojnamegeriya Kurdi, çalaktur bibe, û demek wê were gelê Kurd û bi ragihandîn, xwe pêşkeshi cihanê bike.



Idrîs Hiso

erebi- û ev ji di riya kesen serbixwe re tê çapkirin û belavkirin, diyar dibe ku hin ji ew nikarin rojnameyekê xurû bi zimanê kurdi biwesîn, ev ji diyar dîke bê çiqasî kesen di ragihandîn de kar dikin kîsuya kembûna xwendevanê zimanê kurdi ber bi çav dîgrin.

Herwîsî kovara "Şar" ku (3) hejmar jê hatin belavkirin - Nêvî bi kurdi û nêvî bi erebi - dibe ku wê dabe ber çavên xwe rolek mezin bide nivskarîn bi zimanê kurdi û doxek baş di civatê de biafrîne ji xwendina zimanê kurdi re nexasim dema ku wê got wê nivîsîn ne bê beramber be, û ev xalek girêng e di vê dezgehîn ragihandîn yê ku bi kurdi wê ber bi çav bigirin!

Kovara "Welaî" ku bêtîrê xwe bi kurdiyê, û hin minâkin din ji hene ku ev karê wan dihîle ku rewşa xwendevanîn û nivskarîn bi kurdi baştir bibe. Tevî van minâken me anîn ziman hîna ji gelek malper û dezgehîn kurdan ne bi zimanê kurdi zanyarî û ramanê ji bo kurdan vedughêzin bi bîhaneya ku kes bi kurdi naxwîne! Ez ji dixwazim vê pîrsê bikim ma dema ku kes bi kurdi neniwîse wê çawa kurdi bê xwendin!?

Ji aliyeşî din ve û ji bo ku em xwêneran bê hêvî nekin, mirov divê dadmend be di axaftina xwe de û behsa lehengîya hin aliyan bike ku rîka zimanê dê û kalan xwe bernedane, bi sev û roj xebatê di ber belavkirin û paraştina gotina kurdi de dikin û hêviyâ wan roj bi roj gestir dibe. Ez dixwazim behsa hin nimûneyan bikim ku di serdemû guhertinê şoreşî de encam dan û dibe ku rola wan hin bi hêzîr bibe di paşerojê de. Rojnameya "Buyerpress" ku 16 hejmar pişti hejmar (0) jê hatiye belavkirin - Nêvî bi kurdi û nêvî bi

Koçberî Ji Hesekê Berdewam e

Büye demek welatiyên Kurdi ji ba-jarê Hesekê koçberî dikin ber bi ba-jarê Qamişlo ve diçin, du sedemân serekî ên vê koçbûnê hene, yek ji ji ber rewşa bajêri ewlekarî ya tevlihev, sedema diwem ji ber nebûna derfetên kar li bajêr, bi egera van herdû sedeman bajarê Hesekê vala dibe û xelkên û bajarê ber bi bajarê Qamişlo ve diçin bi mebesta peydakirina jiyanê aram û ditina derfetên kar.

Ji çend mehan û sun ve réjima Be'is hewîl dide ku hevjiyana aştiyane li bajarê Hesekê têk bide, û navkökiyan di navbera her dû pêkhatayen serekî de bajer de (Kurd û Ereb) bi-asirîne, ev yek ji bandoreke neyini li aramîji Hesekê dike û pecvûnêli ser bingehêni mijadperesti li taxen bajer derdixine, lewra hin welatiyên kur malen xwe ji Hesekê bar kirin û ber bi Qamişlo ve çun.

Nebûna derfetên kar li Hesekê sedemek serekî ye ku welati malen xwe li Hesekê vala bîhelin û li Qamişlo têkevin xaniyê bi kirê, çiku bê kar ji nube û piranîya malbaten Hesekê li ser karê rojane jîyan xwe ava dikin, Bavê Dilo welatiyekê kur e, ji nişteciyê Hesekê ye, taxa Salihîye, dibêje: " Sedema serekî ku xelkên

Hesekê jê koç dikin ew e, nebûna derfetên kar û rewşa abori ya dijwar ji xelkên Hesekê re, ku roja zilamê malê kar meke, wisa heqê nanê zarakan ji tune ye"

Beri ku şoreş destpê bibe, Bavê Dilo di warê avakirina xaniyân de kar dikir, û textên wî hebûn, karê wi pir başbû, lê ji du salan û vir de kar rawestiyaye, û tu kes nema avahîyan li Hesekê çedîke, sedemân rawestînîn karên avahîyan li Hesekê li gor ku Bavê Dilo şirove dike pir in, ji wan, pêdîvî û alavên avahîyan pîkêm bûne û eger peyda bibin wê bi nîrxeke pî bilind bin, ji layekî din ve hoste û karker ji nemane û piranîya wan li Herêma Kurdistanâ İraqê û Tirkîye penaber bûne, lê sedema heri giring di nerîna Bavê Dilo de ku avakirina xaniyân li Hesekê bi giştî rawestiyaye, ew e rewşa ewlekarî ya bajer û metrisya welatiyân ji derketîna şerekî giran li nava bajer çiku hîn hêzen Réjîmî li Hesekê hene, herweha réxistina Da'ışa ya tîrörêt nêzîkî bajer dibe û bajer dorpeç dike, û walati bi tirs in ku wêrankirina li Kobanê çebû disa li bajarê Hesekê dubare bibe.

Bavê Dilo niha hewil dide ku texten



Salar Salihî

xwe bifroşê û kar û barê xwe li Hesekê bidawî bibe, daku malâ xwe veguhêze bajarê Qamişlo, ew naçare ku dev ji xaniyê xwe biqere û têkeve xaniyekî bikirî, litew ku ew nebawer e bi vê koçbûnê lê ew bê çare ye, jiber nebûna derfetên kar li bajarê Hesekê. Ji layekî di ve, giripen çekdar ên girêdayî ne réjima Be'is û bi navê "Yen Maskekirî" têna nasîn, hewil didin ku hevjiyana aştiyane li Hesekê têk bidin, û navkökiyan di navbera pêkhatayen bajer de bi afîrinin, herçende jîyanê welatiyên kurd ên sivil dixin bin gefe de, û êdi mirov li Hesekê li ser nasnameya xwe tê girtin, û tê veguhêstîn bo girtigehê taybet, û raseri işkencekirinê û tundiyê tê, weha maşî mirov sivil di jîyanekê azad û aram de bînpê dibe.

Dixwazim Bizanibim Çima Çima û Çima...!!?

«Li Ser Bextê Cegerxwîn Be»

Dema min berê xwe da vê mijarê tirsiyam û sawa gastîna Seydayê Cegerxwîn ez girtim, lê min dilê xwe qayîm kir û dest bi vê mijarê kir tevlî ku dawî negiham yek encamê jî, lê min dît ku ez binvîsim. Dibe ku hin kes bixwînin û bersiva vê mijara tenik û hestiyar bidin.



Cigerxwîn

JİENIGARIYA MIN

bet ji sedema ku Seyda rewşa wî timî ne aram bû, girtin û bazdan û koçberî. Lê pişti ku Seydayê Cegerxwîn berê xwe da welatê biyanîye, û li Siwêdê rûnişt ew i dest bi bîranînê xwe kir, helbet ew i hin bûyer nivîsi bûn, lê li Siwêdê rewşa aramî hişt ku Seyda dest bi nivîsen xwe bike. Seydayê Cegerxwîn di gelek qonaxan re bûrî ye, û bi gelek keşan re dan û sitandin kiriye, em nikarin navê tevan bêjin. Dûbare dibêjîm bûyer gelek bûrîne, û cihî ku mirov li ser bisekne.

Helbet dema ku bîranînê Seyda hatin çapkirin çi kesi ku bi kurdi dixwîne yan jî mijûl e, yekser ew i xwestîye bixwîne, û li nav rûpelê jiyanâ Seyda bigere. Ez ji yek ji wan kesan im ku bîranîn dest bi min ket, û min xwend, û jê têr nebûm. Lê dema ku ez pêrgî bûyrekê bûm ez ji hisketim û min nizanî ez ci dixwînim, û Seydayê Cegerxwîn ci nivîsiye? Min di dilê xwe de hişt, û ji kesi re negot, ew bûyerâ ku Seyda nivîsiye ji sê çar rîzan pêk tê, lê min sed carî xwend, û kerba min nesikest! ez li çapa bi zimanê erebî geriyam û min ew jî anî, di wergêra erebî de ji ew mijar ew e, disê ez bê deng mam, bê çare mam, tirsiyam, ji ber ku yekser hat bîra min ku ez bipirsim çima Seyda wisa gotiye, û çima ev axivtin çebûye, û naveroka wê ji min re bû mereq!?. Min ji gelek nivîskar rojnamevan lêkoliner û pisporan pîrsî, çima wisa hatiye nivîsanid? ew çima çebû ye? ya herî ku min lê pîrsî çima Seydayê Cegerxwîn di bîranînê xwe de nivîsiye! Keskî dilê min hênik nekir, va ez ji we xwendevanan re dinvisim dibe ku hînek bi vê mijarê zanibin, hayê wan jê hebê, bi rastî ez dixwazim zanibim çima û çima...!!?

Di çapa kurdi, di rûpela (267)an de, Seydayê Cegerxwîn dibêje: (Rojekî min ji Barzanî re got:
- Ez benî, ew ayina te ko Qadi re hatibû girtin, gelek ciwan derketibû".

Rojekî min ji Barzanî re got:

- Ez benî, ew ayina te ko Qadi re hatibû girtin, gelek ciwan derketibû.
- Wi di bersiva min de got:
- Ji xwe min di jîna xwe de tenê ew şâşî kiriye ko min ayina xwe bi ew bêbextî re kişandiye.

267

-Wi di bersiva min de got:

- Ji xwe min di jîna xwe de tenê ew şâşî kiriye, ko min ayina xwe bi wî bêbextî re kişandiye).

-Seydayê Cegerxwîn di rûpela (268) an de berdewam dike û dibêje:

-Tevlî ko bi vê gotinê gelek dilnexwîs bûm jî, lê min hew jê pîrsî ka ci bêbextî li te kriye.!!

Tevlî ko bi vê gotinê gelek dilnexwîs bûm jî, lê min hew jê pîrsî ka ci bêbextî li te kriye. Min li ser Qadi Mihemed rîstek ciwan çekirîye Heta

winda kirîm) û mijar wisa hişt, divabû ku baş li ser vê mijarê bisekiniye, ji ber ku ew mijarek dirokî, û cihî sekne ye, li ser gelek bûyeyran Seydayê Cegerxwîn baş nivîsiye, nimûne Seydayê Cegerxwîn li ser bazirganiya xwe û dikana xwe 3 rûpel nivîsine, û her wiha gelek mijarîn di jî, li ser vê mijara ku gelek hestiyar e, watiya wê ci ye, nizanîm.?

-Cegerxwîn berdwam dikê û

Lê ez ê biseknim û ji xwendevanê vê mijarê re bipirsim, dişan çima û çima û çima ev mijar hatiye nivîsin, eger ku rast be, ci mebesta Cegerxwîn jê heye wisa kurt gotiye?

Ü eger ne rast be jî dişan ci mebesta Cegerxwîn jê heye ku ev mijar nivîsiye, ci mebest heye ku di bîranînê wî de hatine çapkirin?

Tevlî ku cihî Pêşwa Qazî Mihe-



dîsan dibêje:

-Min li ser Qadi Mihemed rîstek ciwan çekirîye. Heta niha jî ez wî mirovekî mezîn û bî rûmet dibînim.

- Di çapa bi zimanê erebî de hatiye wergirandin ji hêla Ciwan Eyo, û Dîlan Şewqi. Lêveger: Mamoste Ridwan Isma'il, gotinê Seydayê Cegerxwîn wisa wergirandine:

في يوم قلت للبارزاني: إن صورتك مع القاضي محمد جليلة يا سيدى. رد عليه:

med di dilê Kurdistanê de ye, pakrewan û canfida, û serokê yekem komar, "Komara Mehabad" bû. Qazî Mihemed ne kesekî normal e wisa bî hêsanî tê borîn di diroka gelê kurd de, nexasim di çerxa pîstan de, Qazî Mihemed navê wî dimîne ne tenê de gastîna Çarçira ye de, lê dimîne li ser her bostekî ji aya Kurdistanê. Pêşewa Qazî jîbir nabe.

Barzaniye nemir dimîne bavê

تلك الصورة غلطى الوحيدة في الحياة

تلك الصورة غلطى الوحيدة في الحياة .

كانت تلك الصورة غلطى الوحيدة في الحياة

-Yê wergêr ew parçê bi kurdi ji nivîsiye.

- (Ji xwe min di jîna xwe de tenê ew şâşî kiriye, ko min ayina xwe bi wî bêbextî re kişandiye)

-Disa wergera bi erebî wisa hatiye:

يقول جرخوين: على الرغم من تلك الكلمات التي لم ترق لي، إلا أنني لم أصله لماذا و ماذ فعل الـ (Bêbext) (Bêbext)

نظرت و قصيدة رائعة بحق القاضي محمد، لا يزال حتى الان في نظرى من عظماء الرجال


netwa kurdî di çerxê bîstan de, kar û xebat, bizava Barzani nayê jîbirkirin. Rola Barzani di gaşînên şeran de hişt ku kurd hebin û kurd berxwedanê bikin, û ji mafê xwe yê rewa neyîn xwar, Barzani kurd fêri tekuşerê û lêbûrînê kîrin, Barzani ew kese ku yekser mirov bejna xwe ji kar û xebata wî re ditewine. Barzaniyet Aşî ye, wekhevî ye, biratî ye.

Seydayê Cegerxwîn jî wek ku me di destpêk de nivîsi, yek ji wan kesen ku mîzgînî bû ji bo

على الرغم من تلك الكلمات التي لم ترق لي ، إلا أنني لم أصله لماذا و ماذ فعل الـ

Bêbext
و قد نظمت قصيدة رائعة بحق القاضي محمد ، ولا يزال حتى الان في نظرى من عظماء الرجال

Ehmed Bayan Alani



li ber çavên wî çebûn, vêca giha encamekî ku, mîletê di vê rewşa xirab de bijî, divê mirov bêhînê lê fireh bike, hin bi hin mirov wî bîghîne bawerîyên zanistî, girêdanekî di navbera wî û doza azadiyê de pêk bine.

Berhemê Seydayê Cegerxwîn:

Berhemê Cegerxwîn

Helbest (siir)

1- Dîwana yekem: Prîsk û Pêtî, 1945 Şam

2- Dîwana duyem: Sewra Azadi, 1954 Şam

3- Dîwana sîyem: Kî me Ez? 1973 Beyrûd

4- Dîwana çarem: Ronak, Weşanîn Roja Nû 1980

5- Dîwana pêncem: Zend-Avsta, Weşanîn Roja Nû 1989

6- Dîwana şeşem: Şefeq, Weşanîn Roja Nû 1982

7- Dîwana heftem: Hêvi, Weşanîn Roja Nû 1983 Stockholm

8- Dîwana hestem: Aşî, Weşanîn Kurdistan 1985 Stockholm

Ziman û Ferheng:

1-Destûra Zimanê kurdi, 1961 Bexda

2- Ferheng, perçê yekem, 1962 Bexda

3- Ferheng, perçê diwem, 1962 Bexda

Wergeren wî:

-Kurd. Basîl Nikîtîn Minoriskî

- Leyla û Mecnûn

- Üsiv û Zelixê

- Çiroka xortê Îranî

- Dewleta Mahabadê

- Kêferat li ser Kurdistanê, Xalîfîn

- Baqismatê res

Dîrok:

- Çend Şoreşen kurdên kevnare

- Destûra Kurdistanê

- Dewleta Eyûbî li Yemenê

- Tarixa benî Eyûb perçê 1

- Tarixa benî Eyûb perçê 2

- Tarixa benî Eyûb perçê 3

جک جرخوین

سيرة حياتي



مادحة وندفعة
الاستاذ دهوكان اسمايل

- Ez benî, ew ayina te ko Qadi re hatibû girtin, gelek ciwan derketibû.

- Ji xwe min di jîna xwe de tenê ew şâşî kiriye ko min ayina xwe bi ew bêbextî re kişandiye.

(Li vir Seydayê Cegerxwîn ez

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

مکرخوین

Ey Meded



Azad Hemo

Ax ji ber destê hewêna berhemê
Lale qet dernabirî jan û xemê
Ey meded ey dilbera nazik su-
xen
Ey meded xoş û mefaya seqemê
Xameya xanî ji kû dê bîn me
ve
Da vejinim daneya zîn û memê
Terkeka pir kûr e nayê girtinê
Ev newala ancuman û tev
demê
Ma ji kû wê bête girtin ev
weris Ketye nav destê Hekim
û Sînemê
Sezde bûn bûne sî bizrê kuli
Her hemû ji serwerê vê ser-
demê!
Kursiyê va sikretêra çespe ma
Bin fişara zindikê vê melzemê
Tev Li ser pişa me kortêla
dixun
Bergîren zordariya dar û gemê
Rêvebirya gelxweliser girte
ser
Milk û mewdan û diravê vê
cemê
Da ji nav arê rijimê derkevin
Va biraya em kirin nav
cehnemê

Bavê min


Helbest: Ebid- Eletîf El-
Huseynî
Wergêr: Berhîm şehab

Axax ey bavo
Te ji min pirs kir berî salekê
Dî wek vê rojê de bi xwe
Min ji te re got : (ew xaka ya
ku lis er û li bin
diherike xwînên pak)
Te ji min re got bi şikenandinek
kûr: (em sêwî ne)
Li min bibûrîne - bavo - ku
ez sipasiya
Xwedan bikim - carekê tenê di
jiyanê de -
Ji ber ku tu westiyayê her dû

çav û guhan e
Sipasiya wî dikim ji ber ku tu
guhdar nakî
Û nabîni tiştê ku tê dîtin
Sipasiya wî dikim li ser vê
kombexşiyê
Ya ku tu tê de yi bavo
Tu dikarî kevirekî deyne
vêderê
Û ez dikarim bavêjim xala herî
durtr
Di zemînê de
Çi nerîna te ye bavo.

Azarî Raha
Newroze

Gulal Kasanî

Ey bilbilê Têrijî tu wer bike
fixan
Li Hesekê Newroz cardî, azar
me civan
Va kerwan bi rîket biheje çerx
û dewran
Ev ci ataf û qedaya, em tê de
wer bûn?
Nizanim ne ji xeşma ,yan ji ne
xema
Îro konê pindivî
Reş vegirt li çardor ser her xan
Sera, cad û tax ew tirsetor
Azarmeh e, kerb vebû
Xulpelîl lê rabû dij bê oî ha-
rebû
Miftî tev sotî bû meha tij zo-
belat
Bin hilê roja felat di vê roja
berbat
bi zana manga me kat ey ser-
kerdeyê çareloq
Mayî bê hestemej
We em kirin wek pezê dijî li
deşt e
Bej gazin dê bêjim çend bêje
ye
Were rîjim serêş û gêj im
Ne kêm mêt im
Zanepêj im benî pilanê we pêla
Ber wenda me ez ev birîna bê
qemoş
Ji xwînê bû ye kef xwîn a pîroz û
Aza sema ya ney û def ne ji
derbê berkepî
Nijadê bê dadî lê ji ber bilmaza
Di hiş me de hatî çandî ger em
bi rîz û yek bin
Qendi vî berbarî dê zû bi zû
Ser me hilê ew şeva tarî

Serdemek Dil

Ebdulsemd Mehmûd "
"Bavê Helbest"

Ji penaberekê re
Buhra çavên qerimî
Di sítavên xwe de dimeye
şevek dil
Min bi dîwarê vedengê ve
Dijdine siya dengê te
Min di asoya peyvên xwe de
Dihûne her şev li min dil
dimîne?
Di şeveke sêwî de
Siya dengê te
Min li ber pêlén xwe
Xewar dike
Çi gava bixwazim ji kiliten
xewnêne te
rizgar bibim
Siya dengê te min dagîr dike
Her şev li min sêwî dimîne
Di sînorêن çavên xwe re
Min bibûrîne di şevênil dil û
sêwî de
Min di paxila xwe de biçîne
Li bajarê bumbekirî
Li ber siya dengê xwe
Penaberê tu min razîne
Bi borîna dengê te re
Çemîn miçiqî ji kaniyan
derbûn
Hin ji bêriya dengê te
Diyarı min li dora xwe belakir
Bi ser pişte ve lukumîm
Ta xwêdanekê sîngâ min hênik
kir
Sal 2113 li Rojavayî Kurdi-
stanê kurdeki çend rûpel ji

Xêr Û Şer
Xêr

û şer cêwî ne her dem, herdu ji
yek jêder in
Xêr û şer tav û birûskin, ji zikê
hev diderin
Xêr û şer kanî û av in, tim li
hevdu vedgerin
Xêr û şer wek xwe dimînin,
qaşîlên xwe dugherin
Lê nerînen me cuda ne, em ne
wek hev dinerin
Hin gelek tiştan dibînîn xêr e lê
ew ji şerîn
Şer xurû nîn e û xêr ji, pir li
nav hev digerin
Berf û baran xêr û bêr in, ger di
wextê de werin

Dil Yê Te Ye

Demhat Dêrikî

Bûm evîndarê evînek bê hêvi
dil û çav li min kirin çemê girî
ez dibêjimê yar tu xakî tu gulî
şax stuwar dibî cilmissi bardikî.
Dil dide ser şopâ te penabere
ji ber êşen te birîndar bê çare
ez dibêjim yar tu xakî tu gulî
çî zehmet bi dil ji te venagere.
Ser dilê min neqîşa te çêkirîye
bi xwîna sor rengê xwe daye
çend bêñ tofan te cih girtiye
biborîn sal û çax ev dil yê te ye.

Ciwan ...

Ez nema zanim te bi ci binav
bikim

Biratî , dostanî, hevalti.....

Tevde têra hezkirina her kesê
pakiya dilê te ji nêzik ve ditine
nakin

Tu welat î, xebat î

Tu mirovahiya rast î

Tu viyan î

Derd î, kul î , tu derman î

Sûlavan kurdistanê yên
herûher di helbesten te de re-
wan diherikîn

Têra rondikên bêrikirina te na-
kin

Himên Çiyayê kurdistanê yên
bilind

Têra berzî û bihêzbûna baw-
riya te bi doza te nakin

Tevahiya rûber û firehiya kur-
distanê

Têra valahiya te di dilê
hezkeren xwe de hiştîye nake
Ciwan ci bikim...

Ji roja ku te barkirî

Çav ziwa bûn... di dilde ma
barek girî

Ciwan tu çûşahiya dil te
têk birî

Te arek hiştdikim nakim
venamirî

Her bîranînek arek e...can di-
sojî ser ta seri

Vehêse can bi gorî

Xuyaye xwedayê dilovan tenê
zanibû

Dilê te nema dikare barê kulên
te lê kirne

Ji iro pêve hilgire

Kul û derdên te hîz dibûn

Dema girnjîna te ya xembar
diditin



Siyar Silêman

Dilnexwazên te polî poşman
dibûn

Dema di firehiya dilê te de
wenda dibûn

Hejariyê xwe her dem têkçûyî
didit

Dema nikaribû moralê te yê
berz nimz bike

Û piçekî tenê ji payedariya te
kêm bike

Em iro ji bi şerm mukur tê
Em di xwendina nameyên cavê
te de her dem têk diçün

Di melevaniya kürâhiya
xewnêne te de noq dibûn

Ji berê de pêşîyan gotiye

"jiyan gurzek nêvcî ye"

Lê bawer bike Ciwan

Ew jiyana te ya nîvco
wek helbesten te yên herdem
te digot; min nîvco hiştine

Têra nîşanên tekûziyê ji bo
sîngâ sedên afrandyar û jîndar
heye

ew evîna te ya Memanî ya te di
hêlinâ bêmirdiyê de bê çeng û
per hiştibû

dikare gulên sor ên Valan-
taynên tevaya cihanê, bireng û
bîn bike

Vehêse xembaro

Vehêse dildaro

Vehêse giranbaro .



dirokê dixwendin;
Rûpela Yekem:

Şerêki bazdayî ji tirsê digot:
Heger min zanîba wê ev welat
xwe wêran bike minê qula xwe
di derya de bikola Ji birçina me
hêlinâ xwe xwar...!?

Rûpela Diwem:

Li ber dergehê derya gunehkâ-
riyê kurê délekkî ji kurdeki
di pîrsî Waaa kurdo tu bî kû ve
diçi? Lê vegerand: "Ez diçim
civata Cina Niviştekê bînim
ji xwînê re, Ji nakokiyê re Ji
nehevhezye re Ji kujerê demê
re! Bû tiqtiqa wî, Cin ji we
xber nadin??

Rûpela Siyem:

Me xwe bi xwe bi leyisto-
ka kîşandina werîsan dilîst,
hin ketin, hin şemîtin, hin ra-
ketin, hin poz bilind bûn, bi
têkçûnê!?

Rûpela Çarem:

Heger min zanîba wê ev rûpel
bêne xwendin minê dirok
bişewitanda...!?



Lê di germaya çinînê, tev zîrâr
in bê berin
Tev dizanîn şer ne başe, pêdivî
jê dûr her in
Lê wilo nakin mixabin, tev de
rengê Keser in
zû ji tîrsa ew dibêjin: Em bi
xêrê behwer in

Giyatakênu Ruhnikê
Li hêviya te me ...

Ehmedê Xursî

kengî tu tê ?
Şerân di tarîya rojên min de
biçinî Pivazokên hêviyê
giyatâkênu ruhnikê di dilê mini
beyar de
avbidi bisoyî nemeşa li ser peren
berbangê
bera derwan li min neke
sawîra xwe di ser serê xwe re bîne
û pêxela sibekê iqetîne
bera rengê keskesorê
bikoraniya min de bipejiqin
bihêle destan li hingîv rûdêmê te
bipelînim bera hingîv pêçiyen
min bi demûşa baweriyê ve bimînin

Tiştekî nebêje û li rojan
binihêre

Besam Mistefâ

**

Xalê min Silêman angô Silê
Bi qasî welatekî li ser te digirî

Ji girî bêhtir digirî

Û diçê qirêja nexweşan radi-
male!

**

Diya min ji golan bêhtir digirî
Hêşirênen wê têra deryayekê di-
kirin

Lê nizanim çîma wê sibehê

Gul hemû çilmisin...

**

Dilê berxikê te yê dîlزîj ji
Bi çûna te pir hate pelixandin û
Pir û pir perçiqî..

**

Û Xatê digo Silêmano lawo
Memanî xweş memanî..

Di Salvegera Şehîdê Axa Amûdê De

Celalo... salvegera te ye... salvegera fermana te ye ku di şeveke reş de, li ser maseya xwedan, bê haydarî û dilovanî, ji nişka ve, û bi dilekî sar, biryara wê hatibû stendin. Ma min bizanîba wê koça te, piştana te, nevegera te, û mirina te wilô mina xewnekê, mina listokekê zarakan, yan çirokên ku diyên me ji dehêن salan de em li ser wan dilorandin ta ku çavên me yê melûl bê vîn û matmayî qapaxên xwe tanîn hev, eger min bizanîba mirina te wê wilô be, Celalê min, rihê min, ronya cave apê xwe, mine di serdana dawî ya Hewlêrê, te hembêz kiriba, lêborina xwe ji bo hemû salen buhurîn ku min dilê te tê de hiştibû bixwesta, wek du hevalan destê hev bigirta û em êli bin siya dareke xerîbiyê rûniştana, ta ku te ji min re behsa hezkirî, piroyen pêşerojê, û xewnêñ wek dilê te, kenê te, û tırsa te ya nazik kiriba, min vê dawiyê nas kir - kezeba apê xwe- ku tu bi dil bû yî, û ji ber vê hezkiriyê te jiyanâ guleke buharî ku temen kin in li ser kir, xelk û aleb bi yek hezkirinê bûn Celalê min, tu bi du hezkiriyâ bû, yek ya dil bû û yek axa Amûdê bû, te çima ji min re negot Celaloo...çima? Te çima negot Apo min bi xwe re bibe Amûdê, min bêriyê kirîye, ez dixwazim agirê ku di dilê min de gur bûye vemrinim, tu rûdinişt û bê deng te ji xwe re... dema ku min behsa Amûdê dikir - guhdarî dikir, çavên te li devê min bû, bi şeranî te her gotin ji devê min digirt, û ji xwe re, di nav xwe û dilê xwe de vedîşart, û ez dizanim ta ku tu her şev di xew re diçû, û ta ji te dihat çavên te di ber xwe de didan ta tu dirêjtirîn

dem di wan gotina de birame, hezar wate û wate ji xwe re ji wan re biafirîne.

Celal to rojekê li Amûdê, dema ku min pirsek ji te kir, te got: Apo ez xwe ferî porkurkirinê dikim, ta ku ez herim Elmanayê, li gel Apê xwe, û kar bikim, ez venagerim ta ku ez xwe bi ci bikim, lê aaaaax ax, te fedî kir ku tu bêjî ez venagerim ta ku ez qelenê xwe bidim hev, min ji nexwest ez dêmén te yên sor sortir bikim, te bixim bin fedîye.

Carnan ez dihatim Amûdê, pêrgî te diahitim tu li ser piskilête xwe bû diçû sükê, ger tu li çav min diket, tê bileztir diajot û tayêñ porê te yên mina sinbilên havinê li ber ba mina aleke yek reng li ber ba diherikî, tûrêjîn rokê zerbûna wan û zér dikir yek.


Kuro Celalo, temen qurmiço, xêr ji emr nedîtyo, em ci Karin di çelê te de ji te re bibêjîn..kolana dibistana keçan pîrsa te dike, û tayêñ porê te yê zer nema di çavêñ keçen sagirt de diçirîsine, piskilê te li hewşê, li ber rok û baranê avetiye, dinale, kilita wî zingar girtiye, li hêviya vege te ye ta ku tu careke di lê siwar bibe, û wî li Amûdê, bi dûv hezkiriyâ xwe de li kuç û kolanan bigerîne, wî jî wek te bêriya gerê kiriye.

Te ci anî serê (Hesûnê) xwe, te e w ji wek xwe ji koka wî ji Amûda dilovan rakir, li welatê xerîbiyê gerand, we temenek bi hev re qedan, û dawî...dawî te pişta xwe dayê, bi tenê hiş...te ew bi saxî binax kir, te ew kuş û veneşart. Tu dizanî te perçeyek ji xwe li nav malbatê hiştiye, carnan.. belê gelek caran...na, na her roj û her gav yê ku di ber Hesûn re dibuhure, di dilê xwe

de dibêje weyla ez qurbano Celalo, kêlikek bê deng li ber radiweste, û dûv re dilezîne, ta ku neyê bîra dê ûbav û pê neçsin, her yek ji malbatê naxwaze yê dî biş, û hemû bi te diçsin. Axa ku te bihn kir û mina teberrukê di riwê xwe de da, bawer bik ew û jî bêriya te kiribû,bihna wê ji bi te derket, û ew ji di heman dema ku te giyanê te li ser destê firişteyan mina ayaizeke buharî derket ezmanê heftan, wê ji xwe negirt, kelogirî û bihn çikayî bû, û ta Amûdê da dûv te.

Axa ku li Amûdê li hêviya te bû, çavrewanê te bû, gelek gazinde dikirin,digot: We ew Celal bi saxî dûri min xist, ji min mehrûm kir, û bi hisreta min hiş, iroj mîvanê min e, Celalê min e, delalê min e, dilniya bin, ez û ji we dilovantir bim, wî bi nazikî hembêz bikim, destê xwe bixim bin serê wî, û qet nahêlim bi giraniya min biheste, ev Celalê min e, hezkiriyê min, şehîd min e.

çavê apê xwe..Celal, ez dizanim iroj çavêñ te li riya min bû, te di got apê min xuya nekir... AAx Celal ax, ez qurbana wan tiliyen te yên nazik bin bese kulê apê xwe vê evare tev bide, ez bi gorî wî kenê te bim bes min bişşin ji bo Xwedê Celal, henekîyo..xwein şerîno, hevalê piçûk û mezinan.. bes e.. bes e, ez nema dikarim, her ez tiştekî te tînim ziman tiştim dî têne bîra min.. hewarê Celal, tişten te beriya koça xwe kiribûn, ez bi vî temeni bir nabim ku bikim, te çawa bir bir ku cil û çekan ji xalê xwe Hekimo re bikire, ta tu jê re bişine, cilên ku te ji hevalê xwe Ehmedo re kiribûn ji bo pê here



Qadir Egîd

ezmûneyen xwe yê Bekeloriya pêşkêş bike, waye li xwe dike, ji her kesî re dibêje, ev hevalê min Celal ji min re ji hewlêrî kiribûn, gelekî bi wan serbilind e.

malnexerabo Mihemed, te ewqası ji Celal hez dikir, porê wî ta bi ta şeh dikir, te rojekê dilê wî nedîhiş, te ew li ser tiliyên xwe xwedî kir, ji te qut nedibû, weke hevaleki - ne wek lawekî - te ew bi xwe re digerand, çawa te bi dilê xwe dikaribû, te çawa dilê wî şikand, û ew li welatê xurbetê û ji welatê xurbetê bi ser me de sand mîvan.

Pornekurê Şari, tê xwarnêñ xweş ji iro û pê ve ji kê re çebike, tê li ber kê bigere, tê di ser diwarê hewşê re bang kê bike, û bêje; Kuro Celalo xwarin sar bû law, de wer baba wer. Wê kî deriyen odayen li bin guhê hev bixe eger aciz bibe, û tê wî bi bavê wî bîtirsîne, tê gefa li kê bixwe û fortabide kê, û dawî li ber bigere. Tê her şevê sê-çar caran şiyar bibe, kê binuxumîne, tê sênikê xwarinê her nîvro bixe destê kê de û ji Kalo û Pirê re bişine pişti Celalê henün.

Dilavê, ez dizanim tu li ser her tişte xwe poşman bûye, te jî wek me nizanibû Celalo mîvan e, te her roj pê re şer dikir, û her car ji tu li ber digerya û ew razî dikir. Yara..Yarokê..keçê Yaro..qurbanê Yaro..hest nazikê..tê sibeha hêka ji kê re biqeline, taştiya kê hazir bike.. tişten dilê xwe pişti Celal ji kêre bibêje, wê ki li te guhdar be, û tê bibe sindoqa razen kê.

Zozika min, piçûka malê, û delaliya ber dilê Cello..mane ger tu aciz dibû te digot Cello..tev wilo ji bi te re dikeniya û eger te ew gelekî aciz kiriba, ji bavê xwe re digot: Ji Qîza xwe re bêj ha..!

Semerê..wê ki were cem te Hisiça û bi rojan mîvanê te bimîne, tê diyariya ji kê re bikire ji iro û pê ve. Nisro..Nisrinê...law Nisro.. bi kolan bikev, û bike hewar... Cilên Celal û pêlavâ ku ji bo xelata te kiribû bixe qırka xwe de û kolanê Amûdê yeko yeko biger, ji heval û hezkiriyen wî re bibej, ev in cilên birayê bûkê, bûka ku xelata birayê wê koç bû, azar û eş bû, û temen qurmiçandin bû, du roj mabûn ji xelata te re, gello Celalo çend xewn li ser wê xelatê ava kiribûn, û çend tişt dabûn ber çavêñ xwe ku ji bo te di roja xelatê de bike... xêrjixweneditîyê Nisro...!

Ehmedê min..Ehmedî..tiliya bi tenê..! Celal te hişt û çû, tu rojekê teng nebûyi, te negot çîma ez kar dikim û Cello kar nake, qey te dixwest Celal kar neke, dilê te bi ser ve bû, laşê wî qels û lawaz bû, ne yê kar bû, bıray te yê piçûk û tenê bû, tê pişta xwe bi kê xurt bike, pişkestyo ..malikwêrano..Ehmedo,

Sermola.. ez dexlê te bim...! Te gelck pakrewan hembêz kirin, lê ne mina Celal, pakrewanê Axa Amûdê û hezkiriyâ dil, hêvi dikim, tê lê miqate be, Celal ji xwe hez dikir, bîlhîn xwes bi ser xwe dadikirin, temberiya wî her dem şekirî bû, cilên wî ütikirî bûn, hevalê piçûk û mezinan, kal û pîran, , gula civatan, û desmala ser destê keçan bû.

Celal.. li Apê xwe negre..ku min nikaribû di salvegera te de xort û keçen bajêr bi cilên reş di kolana xistana û bîhişa bi kulman mina salvegera Hisen bi singa xwe bikevin û bikin hawar. Li min negre ku min nikaribû di salvegera te de bîhişa dengê Azanê mîzgeftan û zen-gîlê keniseyan li Esmanê Amûdê li hev bicivin û simfoniya vejerê ji te re bîhûnîn.

Di Kurdî De: Dengên Cêwî, Kêşeya Paşguhkirî



Dr.Şivan Reşik

pir,ker,ker":اطریش,ka,ka:ات,tu,ta:خطه,السنة الفاتحة,cîra,par:ضوء,السنة الفاتحة,pîr,k'er:حصار,k'a,t'a:هات,اداء تقى,t'u:جزء,ç'ira,لسان,p'ar:اداء تقى

Hûn dibînîn niha çawa ev peyv

bi asanî ji aliye dilv û bilêvkirinê

ve jihev hatine veçetandin, çawa

bi asanî rî liber tevliheviyê hat

bîrîn.

helbet ev pêşînyara me ne bê

astengî ye, ji ber ku deriyekî nû li

me videb ku li hemû bêjeyen zîman

ên yek ji van çar tipan dikeve

nîvîsına wan vegeerin û bi dil-

vekî (şikleki) din binivîsin. Rast

e, lê jîxwe karên mezin westanê

mezin divê. û her ne pêwîst e,

şextik li hemû tipen dengser

bikeve,hew dabinkirin û cudaki-

rîna peyvîn tevlihevker dibe ku

bes be.

disa jî em dê bibêjin ku ev

pêşînyara me hemû girêk û alo-

ziyên rînusa kurdi çare nake, lê

dimine gavek li ser rîya rast, belki

niha bala gelek kesan nakişine, lê

ez tekez im, ev kêse dê bibe mijareke

sereke navbera rewşenbir

û nîvîskarîn me, heger bextê zi-

manê Kurdi hebe ku bimîne, loma bû ku-

leke giran li ser dilê Reşido.

bidme te.

Bedrano: Kewê min hêja ye, û şiyar e û destê min jê nabe.

Reşido: Ger tu bîdi min, ez û Çeleka xwe ya zer bidme te.

Bedrano dilê wî bi Kewê wî ve ye, û Reşido ne bi dilekî bi heft dilan dil ketiye Kewê çavbelek. herduyan li hev kirin û Kew û Çelek bi hev guhertin.

Bedrano Çelek a xwe anî malê, lê dît ku şuna Kewê wî xuya dike,

û Kew nabîn! bû hisretik di dilê Bedrano de, ka kengê lê bibe sibeh, da here Kewê xwe vejerîne malê.

Reşido kewê xwe anî mal û basko kir, hingê bi eşq bû û këfa wî dihat, wê şevê zû raza, û roja din li ser dengê derf rabû.

Li ber derf Bedrano bi hevsarê Çeleka zer girtiye, û radestî Reşido kir (Reşido ka Kewê min, şevê din ez ranezame, û Kewê min yê çavbelek ji ber çavê min neçûye, de weşte Çeleka te li te pîroz be).

Bedrano rahişte Kewê xwe yê çavbelek bi dilşadi, û Reşido rahişte hevsarê Çeleka zer bi xemînî.

Paşê Bedrano dûr ket ji nûve Reşido poniji li ser Kewê gozel,

Reşido mesele di serê xwe de bir û anî, û neçar ma ku li bende dema nêçîra Kewan bimîne, loma bû ku-

leke giran li ser dilê Reşido.

Kefstar (II)

Rojekê Reşido dewarên xwe ber bi pişta gundê Niemetiyê ve mexelandin, nêzîkî mala Bedranê Elikê Xino. Û çû dari Kewê wan, dît bê çawa Kewek ji Kewan di rikina xwe de diçê û tê, û pi leptoyî ye. Reşido dilê wî çû li ser wî Kewî. (Bedrano; vî Kewî bide min, û li hember wi jî tu yê ci bixwazi ez ê

Reşido û hevaleki xwe derketin nêçîrê, û xeskîn xwe divedan. Rojekê tiştek dikeve xeskâ wan de, û xeskî bi xwe re dike qula xwe. Reşido û hevalê xwe tê, xeskî nabîn!! didin serşopê, ta diğînîne devê qûlekê, dibejin ev qula keftar e, û gelekî kûre, (ka em dê çawa derxin).

Reşido dibêje ez û bikevin qulê de!!

bi zikrixkê Reşido dikeve qula Kefstar, û tifingê dibin zikê xwe de dikeşine, di qula tarî de Reşido çixata ku ji duhnê masî hatiye çekirin - vêxist.

Xwe gîhande nêzîkî keftar, û lingê wî dît ku di xeskî de ye, û bû erera wî, hema berê tifinga xwe di bin zikê xwe de di de yê, û guleyek berda, li devê wî xist, û ew kuş. Qul dîse tarî bû, lê wî çixat vêxist û dest avete xeskî, û kişande derveyî qulikê. gurandin û goşte wî xwarin, ne mîrekî mîrxas be vî karê wisa nake, di çiya û deştan de jiyanâ xwe bûran dibe.

Amadekirin:

Cano Şakir

Ebas Mûsa

Bizane “Qesel Mehmûd” Dermanê Çi ye?



Qesel Mehmûd giyayek bejna wê 10 – 40 cm bilin dibe. Mehîn Hezîran û Tîrmehê kulîkân vedike. Pelên wê fêkiya wê biçûk e, dirûvê pela berûyê lêdixe. Lê pir hûrik e. Ji ber ku pela wê wek pela berûyê ye, li hînek cîyan jê re dibêjin Berûya Erdê. Navê wê yê navnetewî Teucîrum Chamaedrys e. Li Kurdistanê wek gîyayek çolî xwe bixwe çêdiye. Kulîkân wê peyazî (penbe) û peyaziyê ve kirî û spî ne. Bêhnek xwêş ji kulîkân wê tê. Kêrhatî: Bedenê hêz dike. Agir dadixe. De-

stava biçûk dide avêtin. Alikarîya avêtina keviran dike. Sekinîna ketina kincan diediline. Kuxukê dibire. Li gor pirtûkên kevnar yê Luqman Hekîman, dibêje, ji bo nexweşiyêñ mexde, şekir, penceşerê, bawesîrê, zêdekirina hêza cinsî, qelewkirina zarwan, û jîbo prostatê jî Qesel Mehmût dihat bikaranîn.

Berhevkirin: Qesel Mehmût hewcîye bi çêqan ve bê berhevkirin û di sîberê de li cihek têrhewa bê da-liqandin. Ku hişk bû, bikin nav firaxêñ cam,

an jî di tûrîkên cil de biparêzin. Li gor hewcedarîyê tê xebitandin. Çayê: Kevçiyêñ şîranî kulîkân Qesel Mehmût bikin firaxekê, 150 ml avê berdin ser û bikelinin. Ku keliya ji ser agir rakin û 10 deqan bila dema xwe de bimîne. Paşê biparzinin bi hînek hingiv tamxwes bikin û vexwin.

Jîbo her qedehêk ava sar 2 kevçiyêñ xwarinê kulîkân Qesel Mehmût bavênenê û bila 4 seetan di wê avê de dema xwe bigirit. Paşê biparzinin û hêdî hêdî vexwin.

Peyva Wendayî

r	a	g	i	H	a	n	d	i	n
r	d	i	l	B	e	r	k	r	î
a	ê	n	e	Ş	w	e	r	û	d
w	o	a	r	B	x	r	a	k	n
e	ê	m	ş	O	l	a	ê	e	a
s	d	e	a	î	z	i	l	n	t
t	ü	d	n	V	n	a	d	y	w
a	m	r	û	B	a	r	ê	d	e
n	a	ê	ê	N	î	r	ê	ş	ş
r	i	z	g	A	r	k	i	r	î

Peyva wendayî ji 7 tîpa pêktê, navê bajarekî Kurdi ye .

(ragihandin-rawestan-rizgarkirî-şewtandî-şêrînê-dilber-rûken-amûdê-rûbar-dê-rewşenê-amed-rê-av-şîn-xal-roza-dil)

Xaçerêz

Asoyî

- 1-ajal.
- 2-sê tîp ji peyva Perwane.
- 3-rewşen û rohnî.
- 4-akar û sinc bi Erebî.
- 5-Na bi Ingilîzî-listik bi Soranî.
- 6-navekî keçan e (v).
- 7-cûreyek ji daran di nava çay de tê kelandin.

Serjêr

- 1-navekî keçan e.
- 2-xêza gihîştina zemîn û asman ji dûr ve (v).
- 3-fêrdan .
- 4-devera vexwarina çay li bazarê(v).
- 5-hunera pêşkêşkirina daxwiyanan li ser bîngere.
- 6-jan û azara ji ber êşê.
- 7-haydan û baldarî bi Turkî (v).

Amadekirin: Xoşnav Heso

	1	2	3	4	5	6	7
1							
2		green					
3						light green	
4			purple				
5				orange			
6	red			blue			
7						red	



Mamik ???

- Herher dîwar berber dîwar, xanim yek e, carî hezar?
- Kundirê di latê de, tamên vêqa dinyayê tê de?
- Ser can e û bin can e, lê çermekî wek heban e?

Bersiva Hejmara 16an: Serî – Beq – Kermêş – Kon-Birûsk

Jimara bi tenê

Cihê vala di her malîkê de bi jimara gerek dagre.lê divê ku tenê carekê jimar were dagirtin di her malîkê de,û herwiha tenê carekê were dagirtin li ser xêza asoyî û serjêr

3	5		8	4			7
			7	2			9 5
4			6				1
		2	5		9	1	7
1			4				3
		6	5		2	9	
			4		6	1	
9	3			4	8		
2			3	5	7	9	

Aqil Di Pendên Kurdi De

- 1-Bî girî ranabin mirî !
- 2-barê min ne bese tu jî xurcika xwe davêje ser !
- 3-kew dijmîn xwe ye !
- 4-ne sar li te tê,ne ger li te tê !
- 5-anîna sêwîyan xwes e,xwedikirina wan reş e !
- 6-gotinek heye,lê bi sedî ye !
- 7-kurmê şiri heta pîri !
- 8-nezanî rehetiya can e !
- 9-rev niviyê mîraniyê ye !
- 10-rûnê genî li ser nanê xwedi !

Zûbêjji

Dar daroka li dora me,dar hişk maye ji ber karê me

